Werger, karekê bi zehmet û giring e

Berhevkirin: Xelîl Duhokî - Mesûd Xelef

Nûbûn: Karê wergerê, bi taybet di nava meydana edebî de, di ser hindê re ku karek girane, lê giringiyeke mezin di jiyana her gelekî de ye. Ev giringiye jî bo wê çendê dizivire ku pêdiviye pirên hevnasînê di navbera hemû gelan de bihêne avakirin ku ji kultur û rewşenbîriya hev û du têbigehên û êdî têgehiştinek di navbera wan de peyda bibe.

Kovara **NÛBÛN** ev alîsengiye li ber çav wergirt, lewma panel ji bo karê wergerê terxan kir ku boçûn û dîtinên cuda cuda yên hijmareka rewşenbîr û nivîseran li dor vê pirsê wergirtin. Her wesan kovara Nûbûn di werzê xwe ye zivistanê de, dê bi pêşkêşkirina vê dosya taybet li dor wergerê û ji gelek aliyan ve di nêrîn û hizirên nivîseran de berbiçav bike da ku têgehê vê peyvê bihê naskirin û pitir ronahî bibe, lewma em weku milet di bizava wergerê de, çi nivîskî û çi jî, ji layê medya (tv. radio..) Gelek lawaz mane, eger jî gelekin û di arastekirina pirsên me bo komeka nivîseran wê ji bo xwendevanên Nûbûn jî diyar bibe. Werger lihevanîna kulturên cûdaye, bila em jî bêpar nebin ji nasîna hemerengiya kulturan ji bo îro, sibe û dusibe.